



# Kurdi Bi Efabêya Latîni

Xwendevanên xweştivî!

Her wekî çawa di zimanan da zarave hene. wesa di zaravan jî da devok hene. Bo nimûne: kurmançî zarave ye. Lê Behdîni, Botani, serhedî, devokin. Ev du têkêstên hûn li jêr dibînin bi zaraveyê kurmançî ne, lê ne bi devoka me ne, lewra hûn dê hest bi hinek cudahiyan bikin û lewra jî me li jêr ferhengokek daniye, jî bo ku hûn wan cudahiyan nas bikin!

## MINMINÎK

Eskerê Boyîk\*

Carekê kûsî  
Ji minminîka  
Bedew pirsî:


- Çima ewqas  
kel û lezî,  
Hin difirî,  
Hin dibezî?

- Jiyan roke,  
Şûxûl bere,  
Ewqas karî  
Bikim gere.

Kar ku nivçî,  
Bimîne vir,  
Wê çi bêjin,  
Heval hogir?

Minminîkê  
Caba wî da,  
Lez – bez kete  
Nava deşta..

Kûsî Kenya  
Bêxem, bêkar,  
Û velezya  
Ber siya dar



\* Eskerê boyîk, êk ji helbestvan û nivîskarên navdar ên kurdên soyeta berê ye. Ew li Ermenistanê jiyaye, lê niha wek penaber li Elmanya dimîne.



# Kurdî b'ê lîfayîyî lâtînî

## KEW

Kew bi reng û dengê xwe yek ji ciwantirîn û navdartirîn balindeyên kûvî ye li Kurdistanê .

Her çende kew balindeyekê kûvî ye, lê kedî dibe û li malan tê bi xweyî kirin.

Kew li rojavaya Asyayê, başûr û rojhelata Ewropayê, bakûrê Afrîka û li Yemenê hene.

**Heft coreyên kewan hene:**

- Kew derî
- Kewê sor
- Kewê zinaran
- Kewê berberî
- Kewê gozel
- Kewê çolî
- Kewê çîr

Ji van heft corayan, çar li kurdistanê hene: kew derî, kewê gozel, kewê zinaran û kewê çîr. Ji hemûyan mezintir kew derî ye û ji hemûyan biçûktir jî kewê çîr e.

Kew hêlîna xwe li ser erdê çê dike û di mehên Nîsan û Gulanê da ji 8 heta 24 hêkan dike.



## Ferhengok

- têkst: deq  
kedî: kehî  
xweyî: xudan  
dike: diket  
minminîk: belatînk  
kûsî: kûsele  
bedew: ciwan, xişkok  
çima: boçî  
ewqas: hinde  
rok: roj  
şûxûl: kar  
nîvcî: nîvero  
kenya: kenî, kire kenî  
Velezya: dirêjbû  
Siya dar: sîbera darê